

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





**HÊJE MÊJE  
EMÊ NUHA ÇEND  
ÇîROK Û MESELÊN XWE  
JI WE RE BÊJIN**

**Kulîlk**

**Sal: 1990**

# **BERAZ Û REZ**

**Berhevkar: Bavê Hêvî**

**Divê, rezê mirovekî hebû. Berazek fesidî bû rezê wî û nedîhişt xwediyê rez tu tirî jê bixwe.**

**Xwediyê rez, çalekê di nava rez de dikole, devê çalê bi hejik û cilo vedişêre, ku ew berazê têkeve û bi wî awayî ji wê belayê xelas bibe.**

**Mirov sibê zû tê nav rez û dihere li feqa xwe binere. Gava dighêje ser derê çalê ci bibîne ! Ew berazê ku diket rezê wî ketiye çalê. Ji kêfa ne dizanî bû, ku wê çibike. Hîngî dabû dilê wî, radihêle**



**darekî dirêj û di dilê xwe de dibê: " Ma tê vê carê bi ku de xelas bibî ? "**

Xwediyê rez bi wî darê dirêj bi berêz dikeve. Lê, piştî çend daran lêdixe, lingên wî dişemite û ew jî dikevê çalê. Ew ji beraz ditirse û beraz jî, ji wî. Beraz xwe ber bi jor çeng dike û dixwaze xwe bi ser derê çalê xîne. Xwediyê rez jî, her ku beraz xwe çeng dike, destê xwe dide bin wî û dua dike:

**- Yarebî! Tu vê carê jî li vî heywanî bihata rahmê...**





# **AMERİKA**

<b>Kanada</b>	Otawa
<b>Alaska</b>	Xelîca Alaskayê
<b>Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê</b>	Waşington (Washington)
<b>Kuba</b>	Havana
<b>Haitî</b>	Porto Prens
<b>San Dominik</b>	Santo Domingo
<b>Porto Riko</b>	San Juan
<b>Antilên Mezin</b>	
<b>Antilên Biçûk</b>	
<b>Meksika</b>	Meksiko
<b>Belize</b>	
<b>Belmofan</b>	
<b>Guatemala</b>	Guatemala
<b>Salvador</b>	San Salvador
<b>Hondûras</b>	Tegucigalpa
<b>Nikaragua</b>	Managua
<b>Kosta Rika</b>	San Jose
<b>Panama</b>	Panama
<b>Kolombiya</b>	Bogota
<b>Venezuela</b>	Karakas
<b>Brazil</b>	Brazilya
<b>Giyana</b>	Corc Tawn – Amazon
<b>Sûrinam</b>	Paramaribo
<b>Giyena Fransayê</b>	Kayen
<b>Ekwador</b>	Kîto
<b>Perû</b>	Lima
<b>Bolivya</b>	La Paz
<b>Paraguway</b>	Assunsiyon
<b>Arjantin</b>	Buenos Aires
<b>Urûguaway</b>	Montevideo
<b>Sili</b>	Santiyago
<b>Girava mezin a</b>	
<b>Agiristanê</b>	
<b>Tengava Macelan</b>	
<b>Malvinas (Falkland)</b>	Stanley
<b>Xelîca Sen Xorxê</b>	
<b>Xelîca Korkovado</b>	
<b>Girava Corciya Başûr</b>	
<b>Tengava Dêwan</b>	
<b>Antilên Başûr</b>	
<b>Welatên Graham</b>	




MENDAL Ë MAMOSTE ! TU OIBËJI  
EZ KURD IM. MA KA ALA WE  
HEYE AN NA ? BINÊR VIYA  
ALA TIRKA YË





MENDAL Ê MAMOSTE  
BERÊ XWE DA MALE








ALA ME KESK Û  
SOR U ZER, SPIYE  
SEWHER E.



RENGÊ WÊ  
GAWA YE?



DEMA KOMARA  
MEHABADÊ AVA BÛ  
ALA ME JI GÊ BÛ.  
SEROKÊ KOMARA  
MEHABADÊ QAZI  
MIHEMED BÛ.



DE KA WENE  
ALA ME GÈKE.

EZ È PIRR SA  
BIM BAVO.

12  
DE WER EM È  
BIHEVRE GEKIN.

13





DE KA HÛN JI OIKARIN WÊNEKI  
**ALA ME GÊKIN?**



## **Quncika Matematîkê**

**1) 32 kronên Nûjînê heye. 40 kronên Serdar û 17 kronên Pîro henin.**

**Gelo, bi hevre çend kronên wan çe dibe?**

**Bersîv:**

**2) Bihayıya pirtûkê 35 kron e. Bihayıya pênuşê jî 16 kron ê. Lezgîn dixwaze 2 pirtûkan û 3 pênuşan bikire. Divê çiqas perê wî hebe?**

**Bersîv:**


**3) Nesrîn bi 66 kronan qazaxek û bi 32 kronan çentakî dikire. Ma Nesrîn ji bo herdu tiştan çend kron dide?**

**Bersîv:**

**4) Gurgîn bi 30 kronan cotek gore û bi 75 kronan jî pêlavekê dikire. Ew 200 kronan dide xwediyê dikanê. Gelo dikandar wê çend kronan paş de bide?**

**Bersîv:**

## VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHINNIN HEV



## PÊZANÎN


**1) Her her dîwar,  
Mermer dîwar,  
Her odekê yeke kubar.  
Ew çi ye?  
Bersîv:**

**2) Mûyê du karika,  
Avêtine ser du darika.  
Ew çi ye?  
Bersîv:**

**3) Xal û xwarzî,  
Metik û birazî,  
Hevkirine gazî.  
Ew çi ye?  
Bersîv:**

**4) Deva guri,  
Bişkul firî.  
Ew çi ye?  
Bersîv:**

# MIJÛLÎ



## DİROKA KURD Û KURDISTANÊ DERKET !

Dîroka Kurd û Kurdistanê ji aliyê Amed Tigrîs û Aso Germiyanî ve hatiye nivîsandin. Pirtûka dersê ye.Dîroka Kurd û Kurdistanê di dibistan ên Swêdê de,di dersên zimanê kurdî de, ji bo sinifên 6-7-8 û 9-an dê bê bi kar anîn.

Babetê pirtûkê ji şaristaniya Mezopotamyayê ve dest pê dike û heta dema niha tê.Di destpê ka her babetê de cih oane gotinêngiryan yên ku di babetan de derbas dibin.Di dawiya her babetê de jî,pirs hene.Pirtûk bi nexşê û wêneyên dîrokî hatiye xemilandin.Di dawiyê de jî,bi kurdî,swêdî û tirkî ferhengokek heye.  
Berg bi reng in.


Pirtûk bi metodêngi pedagoîk ên modern hatiye amade kirin.Hevok kurt in.Ziman sivik e.Tîp gir in.

Pirtûk ji aliyê APEC-Tryck Förlag ve hatiye çap kirin.Bihayê pirtûkê 40 kronê Swêdê ye.  
Adresa xwestinê ev e:



APEC-TRYCK FÖRLAG


Box 33 18 ,165 03 Spanga-Sweden

EZ Kİ ME ?



Ez necirvanê miska me.  
EZ ji sir pir hezdikim.  
Ü bi zarokan dilizim.  
EZ Kİ ME ?





NAVÊ WÊ HEYWANÊ ÇI YE ?

NAVÊ YÊ NÊR ÇI YE ?

NAVÊ ZAROKÊ WAN ÇI YE ?

EM JI WAN ÇI DIGRIN ?

EW ÇI DIXWIN ?


# **QUNCIKA DÎROKA KURDISTANÊ**

## **Lê bigere û fêr bibe**

- 1- Li ser nexşeyê gundê Çermo û navçeya Erxeniyê, çiyayê Zagros, gola Wanê, çemên Firad û Dîclê bibîne û nîşan bike!
- 2- Di ferhengê de li peyvên mêtû, dîrok, arkeolog, federasyon, konfederasyon, zanyarî, şaristanî, Mezopotamya, nîjad, çand, çandinî, kevnare, karesat, şûnewar, nêçîr û nêçîrvani yê bigere û wan di deftera xwe de binivîse!

## **Di dîrokê de gotina Kurd**


Kurdistan cîhê avabûna şaristanîyê ya herî kevnare ye. Di dîroka cîhanê de, çend cîhên şaristaniyê yên herî kevnare hene. Mezopotamya, Flisfîn, Misir û Yewnanîstan hinek ji yên herî kevnare ne. Wekî ku tê zanîn, Mezopotamya ji axa navbera çemê Dicle û Firadê re tê gotin. Kurd ji Mezopotamyayê re dibê-jin Mezra Botan. Heta van salêن dawî arkeolog û dîrokzanan digot Misir û Filistîn cîhê şaristaniyê yê herî kevnare ne. Lê, di van salêن dawî de, arkeolog li Kurdistana Başûr nêzîkî çiyayê Zagrosê rastî şûnewarêن gundê Çermo (Jarmo) û Şanîdar hatin. Li gor zanyarî û agahdariya arkeologan, ev gund 6.700



sal Berî Zayîna İsa (B.Z.) hatiye avakirin. Ev gundê herî pêşin e, ku li cîhanê ava bûye. Û herweha dîyar e ku cara yekemîn bû, ku mirov ji nêçîrvaniyê derbasî çandinî û heywan xwedîkirinê bûne. Ev jî, iro li welatê bav û kalên Kurdan derdikeve holê.

Dîsa arkeologên Amerikî, Alman û Tirk di sala 1985-an de li Dîyarbekirê, li dorhêla navça Erxeniyê malek ji bin erdê derxistin. Ev mala ha 9.000 sal kevn e. Wê dîroka mirovatiyê ji binî ve guhart.

Li gor pirtûkên dîrokî û dîrokzaneyan gotina Kurd gelekî kevn e. Ev gotin, heta B.Z. 2.000 salan diçe. Di wê demê de cîran û dîrokzan her yek li gor zanabûn û zimanê xwe navek li Kurdan kirine. Heta serdema Kardukiyan gelekî nav li Kurdan kirine. Lê di serdema kardukiyan dê, êdî bi dokumentên nivîskî gotine; Kardox, kardo, Karduk, Kardux û hwd...



Ev gel di navbera gola Wanê, çemê Dîclê û çiyayê Zagros de jîyaye. Gotina Kurd ji bo gernasî û qehremaniyê bikar anîne. Cîranên Kurdan ên dîrokî li başûr Asûrî, li röjhilat Faris, li bakur Ermenî û li rojava jî Romî bûn. Tirk di wê demê de, li Asya Navîn, di navbera Çin û Mongolîstanê de diman.

*Li Erxeniyê  
maleke 3  
ode ji bin  
erdê derket  
û ew 9 hezar  
sal kevin e.*



Herweha li gor arkeolog û dîrokzanan, 10 hezar sal in, ku mirov li Kurdistanê dijîn. Li welatê Kurdan heta îro gelekî êrîş, koçkirin, bela û karesat pêk hattine. Lê, dîsa Kurdan dev ji axa Kurdistanê berne dane. Li ser axa bav û kalên xwe jîyan e. Ji B. Z. heta îro, Kurd li Kurdistanê, bi navê curbe - cur wekî kom, qebîle, eşîret, mîrîti, an jî bi navê dewletê hebûna xwe parastine.


### Bihizire û bersiv bide

- 1- Ji derî Mezopotamyayê, cîhêن şaristaniyê yêن kevin li kû bûne?
- 2-Di dîrokê de, ji kîjan ax re Mezopotamya hatiye gotin?

## Li Rojhilata Navîn û Kurdistanê

Berî 10 hezar salan li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Kurdistanê, di warê çandiniyê de, genim, çewder û fesûlye hatine çandinê. Dîsa li vê herêmê heywanên wek bizin, mîh û beraz cara yekemîn hatine kedî û xwedî kirin.

Hûn li jêrê, li ser nexşeya cîhanê, cara yekemîn, li kû çandinî bûye û heywan hatine xwedî kirinê dibînin.



# QUNCIKA MUZÎKÎ

## Notenivîs: Zozan Ozmanî

### 5) BÛKÊ DELALÊ

Bûkê, delalê  
Rabe xwe kar ke  
Bûkê, şérînê  
Rabe xwe kar ke

Xemla xwe xweke  
Rûkê xwe sor ke  
Xemla xwe xweke  
Rûkê xwe sor ke

Zava ber malê ye  
Madê xwe neke  
Zava ber malê ye  
Madê xwe neke

Bûkê, delalê  
Bûka kurdan î  
Bûkê şîrinê  
Bûka kurdan î.

$\text{♩} = 108$

### 5 Bûkê delalê

The musical score for '5 Bûkê delalê' is presented on two staves. The top staff begins with a treble clef, a key signature of one sharp (F#), and a 2/4 time signature. The lyrics 'Bû - kê, de - la - pe,' are aligned with the notes. The bottom staff continues the melody with the lyrics 'na - be, xwe, ka - ke.' The music features eighth and sixteenth note patterns, with some notes having stems pointing up and others down. Measure lines divide the staff into measures.

LI HEMBERİ HEJMARAN NAVĒ WAN BİNİVİSİNİN


1 .....

2 .....


3 .....

4 .....

5 .....



## XƏÇEPIRS



## **BERSÎVA PÊZANÎNA**

**1) Tiştekî min heye tiştanî,**  
**Ji diya xwe dibe, Panzdeh roja disechine,**  
**Paşê dest û ling çê dibe.**

Ew çi ye?

Bersîv: BEQ

**2) Apekî minî rû kurkirî,**  
**Şev û roj dardakirî.**

Ew çi ye?

Bersîv: DERİ

**3) Tiştekî min heye,**  
**Bi şev dixemile,**  
**Bi roj ditemire.**

Ew çi ye?


Bersîv: STERK

**4) Berê fûr da,**  
**Misûr çiv da,**  
**Gulek derket,**  
**Nûrek dev da.**

Ew çi ye?


Bersîv: CIRA

## BERSİVA XAÇEPIRSAN



**KEREKÎ ME HEBÛ  
Û KUNDIREKÎ ME  
KERÊ ME  
KUNDIRÊ ME KOT KOT  
  
ME JÎ ÇIROK  
Û MESELÊN XWE  
YÊN VÊ HEJMARÊ  
JI WE RE GOT**

**Kulîlk**







YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNIŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 15:- skr  
BIHA